



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 18

Kurdistan û rastiyan dîrokî di çîroka Tofanê da


Ziringiya bîreweriya nîfşên pêş me:

Profesorê civaknasîyê Richard LaPiere carekê gotiye: "**Heger dîrok wenda bû, rastî jî wenda dibe**"¹. Ev gotineka pir rast û duriste. Raste ku raxistina dîrokê bi awayê mîtologî û ayînî, bi xeberdana bûyerên ne reyalîtî û ne asayî, pir caran bi ramana me ya zanistî ra dikeve nakokî û dijberiyê. Lê ji warê dîrokî va, ew pir girîngin, ji ber ku hin bûyer têda hene bi hezarê salan em ji wan dûrin. Tiştê ku ji me tê xwastin ewe ku em wan bûyeran careka din têxin rêya dîrokî û erdnîgarî ya rast û durist, û em di navbera wan da hevgirêdan û peywendiyê avabikin. Hîngê li ber me rê vedibe ku em pir xaçepirs û pîrsgirêkên ku li ber me girtî bûn, ji hev vekin, em pir rastiyan bibînin û ji dîrokê ra qezenc bikin.

Mijara çîroka *Tofanê* jî wisa ye. Raste ku piraniya bûyerên wê li gor pîvanên naskirina zanistî bi rastiyan ra naguncin. Lê belê em dikarin wan wek pîrekê bi karbînin, ya ku me digihîne hin bûyerên dîrokî, yê ku di berbanga dîrokê da pêkhatine. Heger ne ji ziringiya bîreweriya nîfşên destpêkê bûya ku efsane û rastî tevlihev kirine, me yê zanîna pir bûyeran ji dest xwe berdaba û zirareka mezin bikira.

Ji çîroka *Tofanê* ya somerî, tewratî û qur'anî ji me ra hate diyarkirin ku ew çiyayê keştiya *Nûh* li ser rawestiyaye çiyayekî kurdistanî ye. Navê wî di gotûbêja somerî da çiyayê "*Nisîr*" (*Nisîr*) e û Akkadiya nav lêkiriye çiyayê "*Quti*"; û navê wî çiyayî di dema me da çiyayê "*Pîre Megrûn*" e. Ev çiya di gotûbêja tewratî da bi navê "*Ararat*" hatiye gotin û navê xweyî niha "*Agirî*" ye. Di gotûbêja qur'anî da bi navê "*Cûdî*" hatiye gotin û heya niha jî ev çiya bi vî navî tê naskirin.

Dema em li nexşeya Kurdistanê bi her pênc beşên xwe (Îran, Îraq, Sûriya, Turkiya û Ermîniya) temaşe bikin û bi nexşeya çiyayên Zagros û Torosan ra bidin ber hev ku wek hestiyê piştê (masiyê piştê) yê Kurdistanê ne, ji me va tê xuyakirin ku çiyayê "*Nisîr*" li başûrê Kurdistanê, li nêziya çiyayê "*Şêwe*" dikeve, û çiyayê "*Ararat*" (Agirî) li bakurê Kurdistanê dikeve, û çiyayê "*Cûdî*" li nawiya Kurdistanê, li nêziya quncikê başûr-rojava dikeve. Heger me ev hersê çiya bi xêzên rasterast gihandin hev, sêgoşeyek pêktê ku seriyê wê li bakur û bingeha wê ji başûr-rojhilat ber bi başûr-rojava va dirêj dibe.



Hin pirs û bersiv:

Di rastiye da çîroka *Tofanê* me dide hember sê pirsiyaran:

Pirsiyara Yekem: Gelo çima di gotûbêjên somerî, tewratî û qur'anî da hatiye ku rasterast çiyayekî kurdistanî bûye rawestgeha keştiya *Tofanê*? Gelo çima çiyayê *Tofanê* ne li cihêkî din li dervayî Kurdistanê bû? Gelo çiyayên Kurdistanê maşahin (bimbarekin) û axa Kurdistanê axeka pîroze li ba mezinên xwedawendên Somer û li ba Xweda di Cihûtî û Îslametiye da? Ma ne Xweda bi navkiriye ku ew cihê keştiya *Nûh* wê lê raweste welatekî maşahe (bimbareke)? Ayeta qur'anî dibêje:

﴿إِذَا اسْتَوَيْتَ أَنْتَ وَمَنْ مَعَكَ عَلَى الْفُلِكِ فَقُلِ الْحَمْدُ لِلَّهِ الَّذِي نَجَّانَا مِنَ الْقَوْمِ الظَّالِمِينَ. وَقُلِ رَبِّ أَنْزِلْنِي مُنْزَلًا مُبَارَكًا وَأَنْتَ خَيْرُ الْمُنْزِلِينَ.﴾²

Em bawer nakin ku şîrovekirina olî şêwazeka raste ji bo xwendina çîroka *Tofanê*. Şîrovekirina olî bi awayekî giştî xwe dide aliyê êlîtî, neteweyî û ayînî. Ka em mijarê têxin ser rêya rêyalîtî û logîkî (mantiqî). Deştên Mêzopotamiya helbet nizimin û kendava somerî (farisî) li başûrê wan dikeve. Li başûr-rojavayê wan biyabana erebî ye. Ev hemû herêmên nizimin. Herêmên bilind li dor vê herêmê ji aliyê rojhilat, bakur û bakurê-rojava va tenha çiyayên Kurdistanê ne; çiyayê Şengalê jî di nav da.

Di çîroka *Tofanê* ya qur'anî da çiyayê Şengalê jî tê bi navkirin. Yaqot El Hemewî gotiye: **"Şengal li derdorên Cizîrê bajarekî naskirî ye. Navbera wî û Mûsilê sê rojin. Ew bilindahiyêke di herêmeka bi giştî nizim da. Dibêjin: Keştiya Nûh eleyhi selam gava di ser ra derbas bûye li kopa wî ketiye. Nûh gotiye ev sinê (diranê) çiyayekî ye ku zor li me kiriye (bi erebî "car" li kiriye), loma jêra gotine "Sin-Car", ez nadim pey rastiya vî tiştî, Xweda pê dizane"**³.

Helbet tê naskirin ku çiya warên mimkinin ji bo rizgarkirina ji tofanan. Ji ber ku *Tofan* li Mêzopotamiyayê pêkhatiye, helbet tişteki suriştî ye ku çiyayên Kurdistanê yên li derdora vê herêmê, warên rizgarkirina ji tofanan bin.

Pirsiyara Duwem: Gelo çima cudahî (newekhevî) di navê çiyayê *Tofanê* da heye?

Em bawer dikin ku cudahiya derbarê navê vî çiyayî vedigere ser cudahiya gotûbêj û zimanên ku ev çîrok pê hatiye nivîsandin. Akkadiyan nav lêkirine çiyayê "*Qutî*" û Aşûriyan ji çiyayê "*Nisîr*" bi xwe ra gotine çiyayê "*Kînîpa*". Hîngê arîşe (pirsgirêk) di gotûbêja tewratî da dimîne. Çiyayê *Tofanê* li gor vê gotûbêjê çiyayê *Araratê* (Agirî) ye ku ji başûrê Mêzopotamiya bêhtirî hezar km dûre û ne çiyayekî başûrê Kurdistanê ye, yê ku li nêziya başûrê Mêzopotamiya ye.

Em bawer dikin ku ji gotûbêja tewratî ra du şîrove hene:

Şîroveya Yekem: Ji gotûbêja tewratî tê fêhmkirin ku malbata pêximber Îbrahîm (bavpîrê Ibranan) di bingehê da ji bajarê "Hêrranê" (Hêran) حَرَّانَ ye horî ye. Hebûna malbatê li bajarê "Ûr" (Ur) li başûrê Mêzopotamiya tenha ji bo demeka kurt bû⁴. Di Tewratê da dîsa hatiye ku Xweda "*Bihuşta Aden*" حَدْنِ چاند û *Adem* û *Hewa* حَوَّاءِ xistin nav; û ku ev bihuşt li ba kaniyên çemên Dijle û Ferat bû - li nêziya çiyayê "*Ararat*" Agirî, li bakurê Kurdistana niha⁵. Ev tê wê maneyê ku li gor gotûbêja tewratî, mirovatiyê jiyana xwe ya duwem ji bakurê Kurdistanê destpêkiriye. Nivîskarên rêwîtiyên Tewratê bawer kirine ku *Tofan* li wê herêmê pêkhatiye û ne li başûrê Mêzopotamiya. Hîngê tişteki suriştî ye ku ew bawer bikin, ew çiyayê

ku keştî li ser rawestiyaye û ji wir *Nûh* û yên pêra jiyana duwem ya mirovatiyê destpêkirine, çiyayê "Ararat" (Agirî) be, ji ber ku ew çiyayê herî bilind li wê herêmê ye.

Sîroveya Duwem: Bi me ra di lêkolînên pêşîn da derbas bû ku navê qehremanê *Tofanê* bi nivîskî li ser perçeyek ber (kevir) bi zimanê hêrranî (Haranî) bi şewazê "*Nah-Molet*" hate dîtîn, û ku bajarê "*Hêrran/Hâran/Hewran/Horan*" ji bajarên Horiyan yên here girîng bû, û ku çîroka *Tofanê* di bermaya horî da jî naskirî bû. Ji lew ra, pir gengaz û mimkine ku navê *Nûh* (*Noah*) di çîroka *Tofanê* ya tewratî da di bingehê da ji çîroka *Tofanê* ya horî biribin. Hîngê tişteki surîştî ye ku çiyayê *Ararat* (Agirî) rawestgeha keştiya *Tofanê* be, ji ber ku ew çiyayê herî bilinde di nawenda welatê Horiyan da, pêş belavbûna wan ber bi başûr û rojava da⁶.

Pirsiyara Sêhem: Di gotûbêja qur'anî da hatiye ku navê çiyayê keştî li ser rawestiyaye "*Cûdî*" ye; ne "*Nisîr*", ne jî "*Ararat*". Gelo çî sir û nehîni di pişt vê yekê da heye?

Bi me ra derbas bû ku navê çiyayê *Tofanê* di gotûbêja somerî da "*Nisîr*"e û Akkadiyan nav lêkirine "*Qutî*" û ku navê wî yê niha bi kurdî "Pîre Megrûn"e. Helbet gelek diyare ku nêzîkahiyeke dengdayiyê di navbera peyvên "*Kutî, Gûtî, Cûtî*" da heye. Bi taybetî heger me anî bîra xwe ku ev nav hemî bi navê "*Kûtî, Gotî, Gûtî, Cûdî*" va girêdayî ne û Gotî liqekin ji pêşiyên gelê Kurd.

Helbet, Qur'an li ser pêximber Muhemmedê erebî daket û wî ji Ereban ra ew nav gotin yên ku wê hîngê li ba wan naskirî bûn. Divêt em bêjin ku di wê demê da hemû Ereban ne pûtperest bûn. Belê hinek ji wan Cihû û hinek jî Krîstiyanan bûn. Cihû û Krîstiyanan di warê çandî û belavkirina ayînî da li welatê Ereban û bi taybetî jî li Yemenê çalak bûn. Du olên krîstiyani li welatê Ereban belav bûbûn: Ola *krîstiyani-nesorî* û ola *monofîzî* (*ye'qobî*) يعقوبي. Ev herdu ol jî bi ola fermî ya Dewleta Bizantî ra dijber bûn; ji ber hin sedman ku binavkiria wan li vir ne cihê mijarê ye.

Lê divêt em bêjin ku bingeha çandî ya van herdu olên (mezhebên) *nesorî* û *monofîzî* peywediya xwe ya kîp bi bermaya rojavayê Asiyayê ra bi giştî û bermaya Mêzopotamiya ra bi taybetî hebû. Di nav wê da, navê akkadî yê çiyayê *Tofanê* (çiyayê *Qutî / Kûtî*); li gor Gotiyan (*Gûtî, Cûdî*). Dîsa girînge em bêjin ku herêma Cizîrê ya kurdistanî, bi taybetî jî herêmên Niseyîn û Ruha (Ûrfa) yên ji Hêrranê va nêzîk, herêmên here pêşîn bûn ku krîstiyani lê belav bûbû. Ye'qob El Beradî⁷ يعقوب البرادعي (sala 578 z. miriye), avakerê ola (mezhebê) *monofîzî*, bi xwe metranê Ruhayê (Urfayê) bû⁷.

Ji lew ra, pir gengaz û mimkine ku Krîstiyani pêşîn ketibin bin bandora çîroka *Tofanê* ya akkadî, ji ber ku ew êdî bûbû beşek ji bermaya gelêrî di hawîrdora wan da û wisa wan çiyayê *Cûdî* yê bilind di herêma Cizîrê da wek çiyayê *Tofanê* çespanibin. Û herwisa bi rêya oldarên *monofîzî* ev gotûbêj gihîştibe welatê Ereban û di pey ra jî ketibe bermaya îslamî⁸.

Jêder

¹ Richard LaPiere: Guhartina Gewre, rûpel 345.

² Sûreyê El Mu'minûn: Ayet 28, 29.

³ Yaqot El-Hemewî: Ferhenga welatan, 3/262.

⁴ Seyid Mehmud El Qimni: Pêximber Ibrahîm û dîroka nenas, rûpel 61-71. Fadil Ebdulwahid Elî: Ji Somer heya bi Tewratê, rûpel 190

⁵ Tewrat, Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 2, ayat 7-14.

⁶ A. W. F. Tomlin: Fîlozofên rojhilatê, rûpel 118.

⁷ Niqola Ziyadeh: Krîstiyani û Ereban, rûpel 159-162. Hebib Bedir û hinên din: Krîstiyani di dîroka xwe da li rojhilat, rûpel 195, 198.

⁸ Sidiyyu: Dîroka Ereban ya gelemper. rûpel 129. Niqola Ziyadeh: Krîstiyânî û Ereb, rûpel 159. û li Hebîb Bedir û hinên din: Krîstiyân di dîroka xwe da li rojhilat binêre, rûpel 195, 198.